

Rûpelek ji lênûsa min

Rêberê Silfvî

Beriya derdora 20salan, rewşenbîrekî Kurd, cilda 1ê ji kovara "JÎN" ji bo dîtî û xwendîna da min, weke mirovekî tî ku di kelkela germa havînê de taseke ava sar têkeve nava destên wî, bi dilgermî min rûpelên wê kovarê ji ser hev rakirin, xwendin û pir pê şa bûm.

Bi rastî jî kovara JÎN, ji min ve ne diyar bû, min jî –mîna gelek Kurdan- pê ne bihîstibû. Kovar di roja 07.11.1918an de bi zimanê Kurdî û Tirkî li Istanbulê çap û belav bûye, sernivîserê wê mamoste Hemze Begê Muksî bûye, her heftê carekê derdiket. Ji hejmara 1ê ta hejmara 20an, kovar bi serokatiya Hemze Begê bû, ji hejmara 21ê ta hejmara 25an, bi berpirsiyariya hêja Memdûh Selîm kovarê berdewam kiriye. Piştî hejmara 25an, kovar nema hatiye weşandin û ketiye bin perê ewrên reş û tarî û hatiye qedexkirin. Jîna JÎNê, ji 07.11.1918an dest pê dîke û li 02.10.1919an bi dawî dibe.

Ronakbîrê Kurd ê hêja M.Emîn Bozarşan ew kovar di 5 cildan de kom kiriye, bi dirêjî li ser peyivî ye. Mala wî sed carî ava be ku wî ev karê mezin pêk aniye, nehiştiye ev rûpelê xweşik ji dîrok û

wêjeya Kurdî wînda bibe.

Babetên kovarê yê bi zimanê Kurdî gelekî hêja û giranbûha ne, nemaze gotar û helbestên mamoste Ebdirehêmê Rehmî. Vî hozanê payebilind, li Kurdan kiriye bang û hawar daxwaza hişiyariyê li wan kiriye, daxwaza têgihîştin û zanîna ji gelê xwe kiriye, daxwaza girîna ji gelê xwe kiriye...Lê çi girîna?!.. Ne ew girîna ku em wê dinasin, lê belê qêrîna li gelên cîhanê ji bo ew piştgiriya doza Kurdan bikin. Ewî nivîskarê hêja ev bîr bawerî û ramanên xwe di gotara bi sernavê "Biçûk ne girî, memik naxut" anîna zimên.

Bi rastî, dilê min bi xwendina JÎNê şa bûye, baweriya min xurtir bûye ku gelê me yê gewre yê ku evqas zana û dilsoz afirandine, miletekî sax e û bêgoman wê armanca xwe bi dest xîne, wê armanca pîroz a ku van mezin û nemiran jiyana xwe di ber de fena kirine...Wê rojê, divê gelê me wan fêris û zanyarên ku derdê gel û welat bi wan re çûye gore ji bîr neke û ji wan re dilsoz be... Ez bawer im ku wê pûtên wan comerdan baxçe û gastînanê Kurdistanê bixemilînin.

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê
me yê Kurd re , yê di girtîgehên Sûriyê de*